Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1320 29-Cotmeh-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Parastina mîrate pêdivîyek e ji bo zindîhiştina nasnameya gel’

**Hêvî Keleş/Qamişlo**

**Nivîskarê Kurd Ebas Ismayîl ji kesayetiyên xwedî bandor di tevgera civakî û çandî li Rojavayê Kurdisanê de ye. Wî 37 pirtûkên bi zimanê kurdî ku ketine xizmeta parastina çand û wêjeya Kurdî de, nivîsandine. Ebas Ismayîl derbarê girîngiya parastina mîratiya gel wiha dibêje, “Parastina mîrate pêdivîyek e ji bo zindîhiştina nasnameya gel.”**



Di salên dawî de, di qada çandî û wêjeyî li Rojavayê Kurdistnanê de, pêşketineke berbiçav çêbû. Nivîskar û rewşenbîrên Kurd nasnameya çanda Kurdî ji nû ve vejandin û roleke mezin lîstin. Yek ji nivîskarên kurd ku bi berhemên xwe gencîneya çand û wêjeya Kurdî zengîntir kirin, nivîskar Ebas Ismayîl e.

Nivîskar Ebas Îbrahîm Îsmaîl di sala 1938”an de li gundê Sadan ku bi gundê Dodan ve girêdayî bajarê Qamişlo ye, ji dayik bûye. Derbarê perwerdehiya xwe de, nivîskar Ebas ji me re got: “Min di sala 1954”an de li gundê xwe dibistana seretayî xwend, dibistana navîn li Qamişlo temam kir û di sala 1962”an de ji bajarê Hesekê dîplomeya mamostetiyê û lîseya wêjeyî wergirt. Min sê salan li Zanîngeha Şamê zimanê Erebî xwend, lê rewşa min wê demê nehişt ku ez xwendina xwe temam bikim.”

Ew di dema ku dest bi nisîsandinê kir bi zimanê erebî dinivîsand piştre bi pêşinyara Celîlê Celîl wî dest bi nivîsên kurdî kir. Wî piştî sala 1982”an ve dest bi nivîsên bi zimanê kurdî kir. Yekemîn pirtûk a bi zimanê kurdî di sala 1990”an de bi navê Gula Civatê derket, Îsmaîl destnîşan kir ku ev pirtûk bû deriyê nivîsandina bi zimanê Kurdî û got, “Piştî ku ew li Şamê hate çapkirin, moralê min bilind bû û ez bûm girêdayî xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî.” Heta niha 40 pirtûkên wî hatin çapkirin, 3 ji wan bi zimanê erebî ne û yê din bi zimanê kurdî ne, naveroka van pirtûkan jî li ser çand, dîrok, metelok û pêkenokên kurdî ne.

Derbarê pirtûkên ku wî nivîsandiye, Îsmayîl wiha dibêje: “37 pirtûkên min bi zimanê Kurdî hene, ku çîrokên dirêj, çîrokên kurt, helbest, roman, rewşên civakî û folklora Kurdî de dihewînin. Min li ser bajarê evînê, Qamişlo û çîrokên wê yên civakî nivîsand, ji ber ku di berhevoka min de helbestek dirêj li ser wê hebû bi navê (Çend goşî ji mêwa jiyana min).”

Di serdema piştî sala 2000”an de, Ismayîl bêtir bi zimanê kurdî eleqedar bû, ji ber vê yekê wî pirtûka “Fêrbûna Kurdî” û du pirtûk li ser ziman nivîsand, ku wî ew wekî yekem xebata zimannasî ya Kurdî li Kurdistanê dihesiband. Yek ji wan ferhenga dengan di zimanê Kurdî de bû û ya duyem jî ferhenga metonîmiyan di zimanê Kurdî de bû û pirtûkek ferhengê bi navê “Ferhenga hevwateyan di zimanê Kurdî de”, ji bilî nivîsandina ferhengek Erebî- Kurdî.

Nivîskar Ebas Îsmaîl li ser hezkirina xwe ya ji bo zimanê Kurdî wiha dibêje: “Ez hewl didim çand û wêjeya Kurdî belav bikim, ji ber ku wêjeya Kurdî peyvên resen dihewîne ku ji bo vê nifşê nenas in. Divê ev peyv bi weşandina pirtûkên li ser wêjeya Kurdî, gotinên pêşiyan, çîrokên kevnar û heta stran û efsaneyên bi folklora Kurdî ve girêdayî werin parastin.”




**Yek ji pêşengên çanda bajarê Qamişlo**

Nivîskar Ebas Îsmaîl yek ji kesayetiyên xwedî bandor di tevgera civakî û çandî ya li Qamişlo de ye. Tevî zehmetiyên ku ew pê re rû bi rû ma, ji nebûna piştgiriya çandî bigire heya kêmbûna weşanxaneyên ku bi folklorê re eleqedar dibin, wî qet hewesa xwe winda nekir. Ew îdibêje ku parastina mîratê ne dewlemendî ye, lê pêdivîyek e ji bo zindîhiştina nasnameya gel.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER FEDAKARIYÊ**

**Ciwaniya xwe li ser danî:**
- Ji bo xatirê wî xwe feda kir; jiyana xwe ne xweş kir; xwe pîr kir; mêr nekir.

**Di devê xwe de xwedî kirin:**
- Pir zehmetî di ber wan de kişand; pir êş û derd di ber wan de kişandin.

**Emrê xwe dayê:**
- Ji bo xatirê wî xwe feda kir; jiyana xwe ne xweş kir; xwe pîr kir; mêr nekir.

**Emrê xwe danî ser:**
- Bi heman wateyê.

**Emrê xwe li ser danî:**
- Bi heman wateyê.

**Emrê xwe kir bin piyê xwe:**
- Xwe feda kir; qenciyeke pir mezin kir

**Salên xwe li ser danîn:**
- Ji bo wî xwe feda kir; ji bo xatirê wî pir derd û kul kişandin.

**Xwe avêt çala wî:**
- Xwe feda kir; ji bo wî zerereke mezin da xwe.

**Xwe danî ser:**
- Xwe kir gorî wî; ji bo xatirê wî zehmetî kişand.

**Xwe kir sol kir bin lingê wî:**
- Pir fedakarî jê re kir; derdê wî pir kişand.

**Xwe kir gora wî:**
- Ji bo xatirê wî xwe feda kir; jiyana xwe ne xweş kir; xwe pîr kir; mêr nekir.

**LI SER NELIGORÎHEVBÛNÊ**

**Cot li mitirban nayê:**
- Ev kar ne li gorî te ye.

**Dawet li malê ye, dahol li çolê ye:**
- Ji bo karê ne bi ser hev ve tê gotin.

**Gavanî li mitirban nayê:**
- Ev kar ne li gorî te ye.

**Hirç û govend:**
- Ew tişt ne di cihê xwe de ye; ew tişt ne li gorî hev in; ji hev nagirin.

**Hirç û gêre:**
- Bi heman wateyê.

**Kerê pîr û hevsarê sor!**
- Dema du tişt ne li gorî hev bin hingê tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

**Bi kamîreya Ayşa Silêman**



## Jinan hebûn û pêşketina xwe di qada wêjeyê de îsbat kirin

9'mîn Pêşangeha Şehîd Herekol a Navneteweyî hat lidarxistin, endama Komîteya Amedekar a Pêşangehê Narîman Evdikê û endama Akademiyên Jineolojî Zehrîban Hisên dan zanîn ku îsal beşdarbûna jin di pêşangehê de ji sedî 40'e û gotin, “Di qada wêjeyê de rol, hebûn û pênûsa jin gelek pêş ketiye”.**R-2**



## Kobanê bi berxwedana 134 rojan dîrok nivîsand

Her bajarek ji bajarên Kurdistanê dîrokeke wê ya lehengiyê heye, lê bajarê Kobanê yê Rojavayê Kurdistanê dîroka xwe ji nû ve bi destên Şervan, Egîd û Arînan nivîsand ku cîhan ji tirseke mezin a çeteyên hov DAIŞ'ê rizgar kir. Kobanê bi wêrekiya xwe bû cîhanî û 1'ê Mijdarê bû “Roja Kobanê ya Cîhanî."**R-3**




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1320 29-Cotmeh-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# NEPÊKANÎNA MAFÊ HÊVIYÊ BINPÊKIRINA PÎVANÊN MAFÊN MIROVAN E

Hevserokê Însiyatîfa Parêzerên Sûrî ya Parastina Rêber Abdullah Ocalan Mihemed Emîn Neîmî da xuyakirin ku nepêkanîna mafê hêviyê ji bo Rêber Abdullah Ocalan binpêkirina pîvanên mafê mirovan e. Herwiha Emîn Neîmî destnêşan kir ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan û serxistina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, ew ê di asta herî jor de çalakî û xebatên xwe bênavber dewam bikin.**R-5**




## ‘Pêwîstiya koçberên kampa Waşokanî bi pêdiviyên sereke hene’



Koçberên Kampa Waşokanî 6 sal in di nava êş û zehmetiyan de jiyan dikin. Rêveberê Kampa Waşokanî Yûsif Şêxmûs diyar kir ku bi hatina zivistanê re pêwîstiya koçberên kampê bi pêdiviyên sereke hene.**R-6**

## ‘Bi dengbêjiyê êşên xwe tînim ziman’



Dengbêjê Kurd Nezîr Xidir diyar kir ku dengbêjî çandeke ku ji nifşekî gihiştiye nifşekî din û got, “Min hunera dengbêjiyê ji bavê xwe girtiye, ez bi rêya wê êş û azarên xwe tînim ziman û çanda gelê xwe diparêzim."**R-7**

## Xwesteka gelên Sûriyê ew e ku lihevkirinek çêbibe

Serokê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê anî ziman ku xwesteka hemû gelên Sûriyê ew e ku lihevkirinek di navbera hikumeta veguhêz û Rêveberiya Xweser de çêbibe û got: “Dewletên Rojhilata Navîn ber bi sîstema federalî ve diçin, herwiha wê Kurd di guhertina sîstema herêmê de xwedî rol bin."**R-4**



Qanûn û kevneşopî nikarin pirsgirêkên jin çareser bikin
Nehîr pale R-2

Tirkiyê dest ji hevalbendên xwe yên xwînmêj bernade...
Zekî Bedran R-5



Qonaxeke Nû
Farûk Sakik R-5

# Jinan hebûn û pêşketina xwe di qada wêjeyê de îsbat kirin

**9'mîn Pêşangeha Şehîd Herekol a Navneteweyî hat lidarxistin, endama Komîteya Amedekar a Pêşangehê Narîman Evdikê û endama Akademiyên Jineolojî Zehrîban Hisên dan zanîn ku îsal beşdarbûna jin di pêşangehê de ji sedî 40'e û gotin, "Di qada wêjeyê de rol, hebûn û pênûsa jin gelek pêş ketiye".**

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Pêşangeha Şehîd Herekol 9 sal in li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê lidarxistin, ev pêşangeh di aliyê xebatên edebiyatê li Rojavayê Kurdistanê de xwedî pêşketin û girîngiyeke bi heybet e. Bi hezaran nivîskar û weşanxane di seranserî 9 salan de tê de beşdar bûn û berhemên bi nirx tê de hatine îmzekirin û pêşkîş kirin. Di dewreya xwe a 9'an de Pêşangeha Şehîd Hereko ji asta herêmî derket û bû navneteweyî. Di vê salê de bi taybet berhem û çalakiyên jin her wiha beşdariya wê di pêşangehê de gelek diyarker bû. Têkildarî beşdariya jin di giştî pêşangehê de Endama Komîteya Amedeka Narîman Ebdikê her wiha ji Akedemiya Jineolojî a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Zehrîban Hisên ji Rojnameya me re axivîn.



Narîman Evdikê



Zehrîban Hisên

**'Di qada wêjeyê de rola jin pêş ketiye'**

Narîman di destpêkê de wiha got: "Di qada wêjeyê bi giştî de rol û hebûna jin gelek pêş ketiye û gavên pîroz diavêjin. Di pêşangeha îsal de bi rastî jin bi awayekî pir xurt xwe tê de bi cih kir. Di aliyê berhemên bi pênûsa jin her wiha beşdarî û tevlîbûna wê di îsal de ji sedî 40'e ev yek jî ji salên borî zêdetir e. Her wiha di hundir Pêşangehê de jinên nivîskar hebûn ku hinekan ji wan pirtûkên xwe îmzekirin. Bi taybet şaxek a lêkolîn û berhemên ku ji aliyê Akedemiyên Jineolojiyê ve hatine amedekirin hebû. Bi giştî rojane beşdarbûna jin ji bo pêşangehê bi sedan dihat kirin, hemû jinên di sazî û dezgehan de cihê sardana pêşangehê dikirin. Di heman demê hejmarek mezin ji jinên nivîskar hene ku pirtûkên wan di pêşengehê de amede ne, ew jin ji hemû herêman berê xwe dan pêşangehê da ku berhemên xwe bibînin. Em vê yekê jî bi awayekî erênî dinirxînin".

**Beşdariya jin di pêşangehê de**

Narîman di berdewamiya axaftina xwe de behsa çalakiyên jin di pêşangehê de kir û wiha got: "Ne tenê beşdar bûn her wiha hin çalakiyên jin tê de hebûn. Li ser ziman Hevseroka Desteya Perwerdê weke jin rewşa zimanê Kurdî di salên şoreşê de bi awayekî semîner nirxand, her wiha ji aliyê Akedemiya Jineolojî ve semîner derbarê nirxandina nameya ku Rêber Apo ji Akedemiya Jineolojî re şandiye de hat dayîn. Di pêşangehê de hin karên destan yên jin hatin pêşkêşkirin ku ew jî xweşikbûneke li pêşangehê zêde kir".

**Jineolojî bi 11 pirtûkan beşdar bû**

Her wiha Zehrîban Hisên Endama Akademiya Jineolojî ku di pşangehê de yekem weşana jin e di derbarê tevlîbûna ji pêşangehê re de wiha anî ziman: "Weke weşanên Akedemiya Jineolojî îsal sala 3'yem e em beşdar dibin, îsal em bi 11 pirtûk û berheman amede bûn. Di dewreya 2025'an de belgeyên Konferansa 2'yem a Zanistî ya Jineolojî bi sê zimanan Tirkî, Erebî û Kurdî hatin weşandin. Her wiha pirtûkên notên dersên Jineolojî, pirtûka bingeha dîrokî û şoreşa jin bi Kurdî û Erebî, pirtûka Tezên Azadiyê ya Rêbertî bi Kurdî û Erebî, Şehîd Atakan Mahîr bi Kurdî û Erebî, pirtûka Nagîhan Akarsel bi Tirkî, destpêkek ji bo Jineolojî û pirtûkên derbarê rola jinan di Şoreşa Rojava de, bi giştî bi çavê jin li Şoreşa Rojava nêrandin pirtûkên di van derbaran de hatine weşandin".

**'Pênûsa jin xurtir dibe'**

Zehrîban xuya kir ku her roj pênûs û şoreşa jin mezintir dibe ji ber wê, wê di salên bê de hebûna jin hîn diyarkertir be û wiha domand: "Bi rêjeya ku hatiye diyarkirin, tevlîbûna jin di îsal de ji salên derbasbûyî baştir e. Bi vê yekê re tê xuyakirin ku wê di salên bê de hîn xurtir be, ji ber her roj her kêlî pênûsa jin pêş dikeve, şorşeşa jin mezintir dibe û ev dibe gavek ku jin bi raman, şêwaz, hebûn û îradeya xwe; xwe di qada wêje û nivîsandinê de pêş bixîne".

Di heman demê de Zehrîban bal kişand ser girîngiya beşdariya Jineolojî di van çalakiyan de û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di pêşangehekî weke Şehîd Herekol de ya ku bûye Navneteweyî, em dikarin bi vê wesîleyê çand û kaseyetên cuda nas bikin, her wiha weşangeh û nivîskarên cuda em nas bikin ku çawa li şoreşa me dinêrin, nêrîn, nirxandin û rexneyên wan çi ne em bizanibin. Ji wê zêdetir em dikarin van mijaran, destkeftî, bûyer û geşadanên ku di şoreşa jin de hatine qewimandin û diqewimin bi zimanekî edebî ya jin îfade bikin".

## Ji Pênûsa Jin

### Qanûn û kevneşopî nikarin pirsgirêkên jin çareser bikin

**Nehîr Pale**

Di civaka zayendperest de rojane pêl rûmeta jinê dikin, işkence lê dikin û weke xizmetkaran nêzî wê dibin. Ne tenê ev yek tê kirin, ji jinê dixwazin li hemberî kesên pêl rûmeta wê dikin bêdeng bimîne. Çima jinê fêr dikin ku tehemul bike û bêdeng bimîne, çima li şûna wê jinê fêr nakin ku parastina xwe bike û bighîje rewşa bibe kujer. Saziya malbatê û dewletê fêrbûne hem zulmê li jinê bikin hem jî wê di hemû pirsgirêkan de sûcdar bikin. Qanûn ji malbatê, ol û dewletê nebaştire, li ser encamê hukim li jinê dibire û wê ceza dike. Mêrên destdirêjî li jinê dikin, işkence dikin û dikujin gelo çiqasî hesab ji wan tê têxwestin. Civaka zayendperest bi edalet nêzî pirsgirêkên jinê nabe û bi riya zagon û exlaqên ol wê qeyd dikin. Di civakê de kî bikuje, işkence bike, bidize û pirsgirêkan çêbike bila hesab jê were xwestin, lê bele civaka zayendperest tenê jinê sûcdar dike û her tiştê mêr rewa dike.

Jina ji Til-Temir bêsedem hevjînê xwe nekuştiye, ew bi xwe dibêje ev bûye 19 sal hevjînê wê rojane îhanet lê dikir û işkence li wê û 5 zarokên wê dikir. Çima pirsgirêka wê malbatê gihîştiye asta kuştine? Qanûn, ol û kevneşopiyên civakê çima ev pirsgirêk çareser nekirin û bar hemû li ser jinê hiştin. Jin hene di aliyê ruhî de rojane têne kuştin û dema fîzîkî jî werin kuştin li ser digrin û hesab ji kesî nayê xwestin. Mafê malbat, qanûn, mêr û dewletê nîne ku jinê lêpirsîn bike yan hukim lê bibire, ji ber wan bi xwe jin anîne rewşa bidize, bukjê, madeyên hişbir bikar bîne, ji malbatê bireve û bi mêran re têkeve nava têkiliyên ne rewa. Eger di civakê de navbera jin û mêr de wekhevî hebe û bi edalet nêzî jinê bibin, jin nakeve rewşa bi rêbazên hovane hevjînê xwe bukje û tolê rabike.

Ji bo vê bûyera Til-Temir ji dada civakî têxwestin ku şensê jiyanê bide wê dayîkê û kurê wê. Jineke 19 salan tûndî tehemul kiribe divê firseta jiyanê ji bo wê were dayîn. Li ser asta cîhanî tûndiya li ser jinê tê meşandin, berdewam dike. Tevgerên jin li hemberî zîhniyeta zayendperest û tûndiya li jinê tê kirin, têdikoşin. Mirov nikare bibêje giştî jin di nava vê têkoşînê de ne û berpirsyartiya çareserkirina pirsgirêka cinsiyetparêziyê rakirine. Jinên ku têdikoşin jî, jixwe saziya malbatê, civaka zayendperest û dewlet her tim êrîşî wan dikin û li pêşiya xebatên jin dibin asteng. Bi sedan jinên têkoşer di zîndanên Îran û Tirkiyê de ne, jinên Afxanistan jî ji ber mafên xwe dixwazin û Talîban qebûlnakin her tim têne kuştin û destdirêjî li wan tê kirin. Ji xwe rewşa jin li Îraq, Tûnis û giştî dewletên Rojhilata Navîn li ber çav e. Jin ji bo guhertin û veguhertina zîhniyeta mêr têdikoşe lê belê pirsgirêkên jin wê jin bi xwe çareser bikin û pişta xwe nedin malbat û dewletê. Niha Kongreya Star û Meclisa Kombûna Jin a Zenûbiya bi riya komîteyên xwe berpirsyartiya çareserkirina pirsgirêkên jin rakirine. Hemû.

# Nameya ku Rêber Apo ji bo Jineolojî şandiye bo me çi rave dike...(3)

**Îsyan Karadeniz**

''Pêwîste nasnameya jinê ya ku hatiya avakirin ji hêmanên zayendîperest were paqijkirin. Divê jin ji bo vê yekê lêhûrbûn bikin. Eynî wekî ku V. Woolf gotiye; divê odeyek aydê jinê bi xwe hebe. Pêwîste derbarê xwe de bifikire û karibe xwe ava bike. Rêber Apo bi van gotinan bal dikşinê ser xwebun, irade û fikrê azad a jinê. Wekê jin ketina ferqa xwe, di ferqa êrişên li ser nasnameya xwe da buyin bi zanabuyinê ve girêdayî ye.

Hewceye kû em ji xwe pirs bikin; em kengê xwe aidê xwe his dikin? Kijan kêliyên me aidê yên me ne? Bi rastî jî ev his, ev daxwaz yên me ne yan yê hineka ne?

Mirov dikarî van pirsan zêde bike û bersivên van bi rojan niqaş bike. Ji bo na vê jî Rêber Apo minaka Virginia Woolf dide û qadên xweser a jinan çiqasî pêwiste û bêyî vê nabe carekî din tîne ser ziman.

Jinwar bi vê rol û misyonê radibe û wekê gundekê aidê jinan ku bikaribin li vir xwe ji nû ve bi nasnameya xwe ya azad ve biafirînîn, yên aidê û yên ku li ser wê hatiye ferz kirin ji hev bineqînîn. Da ku bibin minaka şenber a xwebunê. Ji ber ku xwebun buyerekê him fikrî û him jî laş yanî cismî ye. Xwebun di hundirê xwe de hebûn, form û şekil girtinê dihewine.

Gelo hebun çi ye?

Hebunekê me ya bi çi awayî heye? Dema em li jiyana xwe binêrin di naskirina derûnî û laşê xwe de em çiqasî xwedî agahî ne? Em çiqasî xwe nas dikin, nasnameya xwe ya hebunê de wekê jin çiqasî xwedî lêkolin in?

Gelek caran di van aliyan de nefikrandinên me dihêlin ku hinekan li şuna me biryar bidin an ji biryarên ku em dibejin ya min e; di esasê xwe de ne ya bi aqlê jinê, bi hisê jinê ne. Ji ber ku nasnameyekê jinê ya bi hezaran salan hatiye tepisandin heye û ev jî dihêle ku jin ji nasnameya xwe ya rast dûrketinek jiyan bike. Ji ber vê aloziya ku niha di nasnameya jinê de tê jiyîn gelek kûr e û pêdiviya vê lêkolinên sosyolojik hene. Nasnameya jinê ya ku bi şewaza aqlê jinê ve di çi astê de hatiye avakirin? Em çiqasî ji van agahdar in, em meraq dikin? an jî çiqasî bala me dikişine?

Rêber Apo di vê derbarê de nameya xwe ya de wiha diyar dike; ''Jîneolojiyê bi vê mebestê rêyek girîng derbas kiriye. Kedeke bi nirx hatiye dayîn. Niha pêwîste ev ked, bi pêvajoya nû re hîn zêdetir wateyê qezenç bike. Pêwîste hebûna jinê rast were pênasekirin û nasname û hebûna jinê bi rêbaza wekhevîbûnê bê nirxandin.''

Pêdivî heye ku her jinek bi Jineolojî ve xwe bigihinê raza jiyanê,nasname û hebunê. Bi nasnamebuyin, bi lêgerin û lêkolinên zanistê jinê ve dikarê xwe bigihinê azadiya civakî û tahlilên civaknasiyê. Ji ber ku wekê ku Serokatî jî tîne ser ziman; zanista ku li derdora jin bê avakirin wê bibe gavek destpêk a ber bi sosyolojiya rast ve.



# 'Bi dengbêjiyê êşên xwe tînim ziman'

**Dengbêjê Kurd Nezîr Xidir diyar kir ku dengbêjî çandeke ku ji nifşekî gihiştiye nifşekî din û got, "Min hunera dengbêjiyê ji bavê xwe girtiye, ez bi rêya wê êş û azarên xwe tînim ziman û çanda gelê xwe diparêzim."**

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Dengbêjî kevneşopiyeke gelekî girîng e. Di dîrokê de Kurd her dem neçar bûne ku çanda xwe bi "deng" an jî bi "gotinan" dewrî nifşê nû bike, ji ber ku nivîs û pirtûk di nav Kurdan de pir kêm bûn. Di hêla gotin, stran û çîrokan de, bi gotinên dengbêjan hetanî roja îro hatiye û winda nebûye. Mirov dikare bêje dengbêjî esasê çanda Kurdan e. Em li dîrokê dinêrin piraniya dengbêjan ji derveyî karê dengbêjiyê bi tu karî ve têkildar nebûne û tenê xwestine çanda Kurdewarî li ser lingan bihêlin.

Dengbêjên Kurd, çanda Kurdan bi awazên xwe yên hestyar heta roja me ya îro anîne. Yek ji dengbêjên Rojavayê Kurdistanê Nezîr Xidir e. Nezîr Xidir di 10'ê Tîrmeha sala 1962'an de li gundê Kelhê ji dayîk bûye, wî jiyana xwe li beyaran li ber sewalan derbas kiriye. Di sala 1971'an de ew derbasî dibistanê bûye û heta refa 8'an xwendiye. Lê ji ber mercên madî wî dest ji xwendinê berdaye û careke din berê xwe daye beyar û sewalan. Di derbarê jiyan û hunera dengbêjiyê de dengbêj Nezîr Xidir ji Rojnameya me re axivî.

**Kurtejiyana Nezîr Xidir**

Nezîr Xidir da zanîn ku dengbêjî bi zarokatiya wî re mezin bû ew li beyaran fêrî wê bûye û wiha got: "Sedema êş, zor û zehmetiyên ku mirov di jiyana xwe de dibîne dengbêjî yekser pêre derdikeve û dibe derman da ku êşa xwe jibîr bike. Sedema êşên ku min di jiyana xwe de dîtî û ji zarokatiya xwe ve li çol û beyaran bûm, min dengbêjî ji bo xwe kir dermanek da ku bi rengekî cûda li jiyanê binêrim û berdewam bike. Lê mamostê destpêkê ku bingeha dengbêjiyê ji min re çêkirî bavê min bû. Li beyaran netenê li ber sewalê xwe bû, di heman demê de li ber sewalên gundiya jî bû, bi mehan ji derveyî gundê xwe dimam û li gundinê din li ber sewalên wan jî dimam. Zemanê berê wisa bû heger te bi destê xwe pariyê xwe nekir devê xwe de kes pariyê te nakê devê te de. Pêwîstî hebû ku mirov kedê bide heya ku karîba debara jiyana xwe bike. Heya roja îro jî tevî rewşa min ya tenduristî nebaşe jî lê hîn ez sewalên xwe didûşim, ji ber ku di çanda koçeran de ji bo me kêmasiyeke ku jin here sewalan bidoşe. Em rêzgirtinê ji jinê re digrin û hertim wê didin pêş lewma nabe bi vî karî rabe."

**Kar û xebatên ku dayî meşandin**

Xidir axaftinên xwe domand û wiha got: "Piştî Şoreşa Rojava dest pê kir ew rihê welatparêziyê li cem min vejîn bû, min bar girt ser milê xwe û ji bo hemû saziyan kar kir. Êdî bi hemû rengî min xwe xist bin xizmeta civakê de. Destpêka avabûna Hêzên Parastina Cewherî min cihê xwe têde girt wek berpirsiyar û heya niha jî cihê xwe têde digrim. Di heman demê de cihê xwe di komîta Lihevanînê de jî digrim. Destpêka ku koma Cûdî hat damezrandin ez bûn yek ji endamên wê, lê niha ji ber rewşa min ya teduristî nebaşe ez hinkî jê dûr ketime, dema bernameyên taybet hebe ez tevlî wê dibim. Min gelek stran gotine ji wan Birîte, Peyzok, Heyranok, Jaroheyran û Heyterazîn, herwiha tevlî gelek şevbuhêrkên dengbêjiyê jî bûme. Di 20'ê Mijdara sala 2022'an de sedema êrişên dagirkeriya Tirk li ser gundê Teqil Beqil ez û hevalên xwe em çûn da ku alîkariyê bidin kesên birîndar, lê dagikeriyê êrîşî erebeya min jî kir û hemû hevalên min yên bi min re şehîd bûn, ez jî birîndar bûn û heya niha mam hevalek gazî. Lê tevî wilo jî heya roja îro ez di malê de rûnanim çi kar dikeve ser milê min ez dikim."



# Keça ku bi morîkan rêya xwe ber bi hêviyê ve çêkir

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Li quncikek biçûk a odeya xwe, Yoliyana Denho a 15 salî li ser maseyekê rûniştiye ku tijî qutiyên biçûk ên morîkên rengîn, têlên şefaf û amûrên hêsan ên ku wê wan berhev kiriye ye. Ev cih ne tenê wekî quncikek ji bo karên destan xuya dike, lê belê wekî cîhanek tevahî xuya dike ku keçik xewnên xwe perçe bi perçe di nav rengên ku çîrokên hêviyê vedibêjin de, çêdike.**

Yoliyana Denho di pola sêyemîn a dibistana navîn de ye. Dema wê ya vala wisa nare, ji zarokatiya wê ve, kêfa wê ji temaşekirina keçên ku destkariyên cûrbecûr ên wekî nakiş, dirûnê, ji nû ve bikaranîn û çêkirina morîkan distînin, dihat. Ew ji şiklên xweşik ên ku ji destên wan derdiketin matmayî ma û ev yek hişt ku ew bi xwe jî biceribîne. Wê bi qutiyek sade dest pê kir ku tê de têl û hin morîkên rengîn hebûn. Bi derbasbûna demê re, ramanên wê dest pê kirin û meraqa wê ya ceribandina şiklên nû zêde bû, heta ku morîk bûn cîhana wê ya herî nêzîk û afirîner.

**Destpêka xewnê**

Dayika wê, dema ku ev hobî dikir bala xwe da eleqe û kêfxweşiya wê, wê teşwîq kir û qutiyek ji morîkên mezintir û cûrbecûrtir kirî jê re. Ev ezmûn ji tenê lîstikekê veguherî hobiyek bi zelalî hatî destnîşankirin, paşê jî bû armancek cidî ku dikare pêşeroja wê ya pîşeyî şekil bide. Karê Yoliyana Denho zû bala heval û cîranên wê kişand û wê dest bi firotina hin perçeyan bi bihayên sembolîk kir. Bi demê re, daxwaz zêde bû û keçika ciwan dest bi birêvebirina karsaziyek biçûk ji mala xwe kir. Tevî derfetên xwe yên kêm jî, ew karîbû morîkên xwe veguherîne çavkaniyek alîkariyê ku alîkariya malbata wê kir ku bi zehmetiyên jiyanê re mijûl bibûn. Bi belavbûna modeya çenteyên bi morîkan, xwestina jinan jê re hêdî hêdî zêde bûn. Yoliyana Denho hîn jî xwendekar e, lê wê kariye xwendin û hobiya xwe di demên herî dijwar de jî hevseng bike. Ew dibêje: "Di dema ezmûnan de, bi taybetî di betlaneya Cejnê de, min xwest ku çend çenteyan çêbikim. Tevî zext û strêsa mezin a ku bi min re derdiketin, min karîbû karê xwe biqedînim. Di heman demê de, min ji amadekariyên ezmûnên xwe paşve gav neavêt." Bi vî awayî, ew ji temenê biçûk ve fêr bû ku serkeftin hewceyê demê rêxistinkirinê û şiyana rûbirûbûna bi dijwariyan re ye.





**Hêvî karên hêja diafirîne**

Rê her tim ne hêsan bû, ji ber ku ew bi gelek dijwariyan re rû bi rû ma, ya herî berbiçav jî zehmetiya bidestxistina madeyên karê wê bûn, ji ber ku morîkên ji her reng û şeklî her tim li herêma wê peyda nedibûn, ev yek jî wê neçar kir ku wan ji herêmên din bixwaze. Lêbelê, vê keçika biçûk dev ji xewna xwe berneda, ew lêgerîn dikir heta ku tiştê ku ji bo temamkirina karê xwe hewce dikir bibîne. Çavkaniya wê ya sereke ya agahdariyê înternet û malperên medyaya civakî bûn. Tiştê balkêş ew e ku Yoliyana Denho di pîşeya xwe de tu perwerde nedît, ew bi temaşekirina vîdyoyên fêrkirinê yên li ser intenêtê yên ku hiştin baweriya wê bi xwe xurt kirin û wê ji bo serkeftinê biryardartir kirin, li ser xwe xebitî.

Lê ji bo Yoliyana Denho, çîrok ne tenê karsaziyek bû, ew peyamek bû ji bo cîhanê ku temen armancê diyar nake. Ew her morîkekê wekî derfetek dibîne ku xwe û çîrokên mirovên li dora xwe îfade bike.

Di dawiya axaftina xwe de, Yoliyana Denho li koma morîkên li pêşiya xwe nêrî û bi kenek aram got: "Her morîkek biçûk mîna xewnekê ye. Dema ku em wê bi têla sebrê ve girê didin, em jiyaneke xweşiktir diafirînin."

Divê her keçek ku xwedî behreyek e ji bo pêşxistina wê pir bixebite û dev jê bernede. Ger hûn carekê têk biçin, ev destpêka serkeftinê ye. Karên destan ne dijwar in, lê ew dem hewce dikin. Hûn ê nasbikin ku hûn dikarin gelek tiştan bi dest bixin. Yoliyana Denho mînakek keçeke azwer e ku dizanîbû çawa jêhatiya xwe veguherîne derfetekê û çawa hobiya xwe ya biçûk bike destpêka xewneke mezintir ku dibe ku di pêşerojeke nêzîk de bi şiklê projeyek serketî û îlhambexş ji bo gelek keçan pêk were.

# ‘Pêwîstiya koçberên Kampa Waşokanî bi pêdiviyên sereke hene’

Koçberên Kampa Waşokanî 6 sal in di nava êş û zehmetiyan de jiyan dikin. Rêveberê Kampa Waşokanî Yûsif Şêxmûs diyar kir ku bi hatina zivistanê re pêwîstiya koçberên kampê bi pêdiviyên sereke hene.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Di sala 2019’an de dewleta Tirk a dagirker bi aweyekî hovane êrişî Serêkaniyê û Girê Spî kir, di encama êrîşan de gelên van her du bajaran neçarî koçberiyê bûn. Gelên bajarê Serêkaniyê û Girê Spî berê xwe dane herêmên bi ewleyên yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha Rêveberiya Xweser ji wan re Kampa Waşûkanî û Serêkaniyê di sala 2019’an de li bajarokê Tiwêna ku 12 km li Rojavayê bajarê Hesekê dikeve, ava kirin. Di kampê de ji aliyê Rêveberiya Xweser ve binesaziya bingehîn ji gel re hat amedekirin, çadir û depoyên ava vexwarinê hatin dabînkirin, erd ji hev hat veqetand, toreya elektirîkê di kampê de hat belavkirin û kamp li ser komînan hat dabeşkirin. Di nava kampa Waşokanî de 1 hezar û 400 malbat û 17 hezar û 70 kes hene. Di heman demê de, Kampa Waşokan heta sala 2023’an jî, ji aliyê UN’ê ve ne naskirî bû û ne jî weke kampeke fermî hatibû erêkirin, ji ber vê yekê xizmetên wê, tenê bi dabînkirina hin konan sînordar bû, lê piştî çend mehan hin rêxistinan mudaxele kirin û destek dan ji bo pêşkêşkirina



xizmetguzariyê ji koçberan re. Di derbarê rewşa Kampa Waşokanî de, rêveberê Kampa Waşokanî Yûsiv Şêxmûs ji Rojnameya me re axivî.

**‘Bi hatina zivistanê re pêwîstiya koçberan bi pêdiviyê sereke heye’**

Yûsiv Şêxmûs anî ziman ku bi hatina zivistanê re pêwîstiya koçberan bi pêdiviyên sereke hene û wiha got: “Bi hatine zivistanê re pêwîstiya koçberan bi pêdiviyên sereke hene û bi taybet kelûpel û pêdiviyên zivistanê. Herwiha ev şeş salin konên kampa waşokanî ne hatine guhertin, ev konin rizî û têkşûn e. Ji ber vê yekê pêwîst e her sal konên kampê bên guhertin, guhertina konên kampê ji rêxistinên navdewletî tê xwestin. Di heman demê de, heta niha tu rêxistin di mijara guhertina konan de alîkarî ne kirî ye. Her rêxistineke dibêje kel û pelên me tune û Rêveberiya Xweser jî li gorî derfetên xwe destekê dide koçberên kampa Waşokanî.”

**Rêxistinên ku di nava Kampa Waşokanî de dixebitin**

Şêxmûs axaftina xwe wiha berdewam kir: “Rêxistinên ku di warê tenduristî de, di nava kampa Waşokanî de kar dike, Heyva Sora Kurd e û barê herî giran li ser pişta wê ye. Herwiha rêxistinên ku di warê dabînkirina pêwîstiyên sereke de, rêxistina Rîlê, rêxistina IRC in. Ji aliyê van her du rêxistinan ve rêvebirin û çêkirina pêwendiyan ji bû dabînkirina xizmetguzariyên av û paqijiyê li kampê tê kirin, herwiha dabînkirina xwarinê jî, ji aliyê wan ve têkirin. Rêxistinên ku di aliyê parastinê de dixwebitin, mîna Rêxistina Aştiyê, Rêxistina Nûdem û Rêxistina Rîlêf ne. Di nava kampê de, Mala Jin, Weqfa Jin, Kongra Stra hene, yên ku di aliyê jinê de dixebitin. Di heman demê de, di nava kampa Waşokanî de sê dibistan hene, di wan dibistanan de minhacê Rêveberiya Xweser tê dayîn.”

**‘Em li gorî derfetên Rêveberiya Xweser destekê didin koçberan’**

Yûsiv Şêxmûs anî ziman ku wê ji aliyê rêxistinên di nava kampa Waşokanî de, kel û pelên serke yên zivistanê di dema bê de werin belav kirin û wiha pê de çû: “Em li gorî derfetên Rêveberiya Xweser destekê didin koçberên Kampa Waşokanî. Astengiyên ku derdikevin, ew jî mijara guhertina konên kampê ye, pêwîst e di demeke nêzê de konên kampê bên guhertin. Hin malbat hene, kel û pelên zivistanê ne gihiştine, lê em hewl didin ku di dema nêzê de wan kel û pelan ji wan re peyîda bikin.

Koçberên kampa Waşokanî ev şeş salan di nava êş û zehmetiyan de jiyan dikin, herwiha pêwîstiya kampa Waşokanî bi pêwîstiyên girîng heye, mîna guhertina kon anjî çadirênên kampê, belavkirina mazot, avakirina cihê xwaringeh û serşûştinê ji bo her kon a çadirekî pêwîst e. Di heman demê de birêxistinkirina kenalên avqirêjiyê di nava komînan de ji bo rijandina ava şûştinê. Herwiha paqijkirina dîwarê kampê, danîna batonê li binê konan û lêkirina derdora wê bi 4 rêz ji bilokan ji bo parastina konan ji baranê. Pêwîstiya her malbatekê bi cihê xwaringeh û serşûştinê yê taybet heye, ji ber piraniya pirsgirêkên kampê ji ber hevbeşbûna cihê serşûştin û xwaringehê ye. Girîngî û piştgiriya dibistanan di warê lojîstîk, qirtas û kincên yekreng de û guhertina hemû konê di kampê de.”

**‘Pêwîst e bi aweyekî lezgîn mijara vegera koçberan were çareserkirin’**

Rêveberê Kampa Waşokanî Yûsiv Şêxmûs axafina xwe wiha bi dawî kir: “Ruxmî ku gelên Serêkaniyê û Girê Spî kampa Waşokanî ji xwe re kirine cih, lê belê bi hêviya vegera bajar, mal û milkê xwe bi israr in. Ji sala di 2019’ an ve dewleta Tirk Serêkaniyê û Girê Spî dagirkirî ye û heta niha jî di wan bajaran de, dagirkerî berdewam e. Pêwîst e hêzên navdewletî bi aweyekî lezgîn çareseriyekê ji koçberên Serêkaniyê û Girê Spî re bibîne, da ku koçberên van her du bajaran berî serê salê vegrin cih û warên xwe yên resin. Di heman demê de, em bi hêvî ne ku berî serê salê koçberên Serêkanî û Girê Spî vegerin cih û warê xwe.”

# Madeyên hişbir xewin û siberoja ciwanan winda dike

**Navenda Nûçeyan**

**Madeyên hişbir yek ji diyardeyên herî xeternak li ser civakê ye, bi taybet li ser nifşê ciwan ku stûnên siberojê û hêviya guhertinê ne.**

Rêjeyên bikaranîna madeyên hişbir li cîhanê sal bi sal zêde dibin, heta ku ew bûye pirsgirêkek cîhanî ku di raporên rêxistinên tenduristî û civakî cihê yekem digire. Amarên Neteweyên Yekbûyî nîşan didin ku bi mîlyonan ciwan li çaraliyên cîhanê hin cureyên madeyên hişbir yên çêkirî û xwezayî , bi kar tînin û dibin sedema windahiyên mezin ên mirovî û aborî.

Lêkolînên li ser madeyên hişbir nîşan didin ku di salên dawî de di nav komên cûda de belavbûna wê berfireh e. Dibe ku sedema vê yekê zêdebûna pirsgirêkan û zehmetiyên jiyanê be, nemaze bi belavbûna teknolojiyê û nebûna têkiliyê di navbera mirovan de.

**Çima ciwan madeyên hişbir bi kar tînin?**

Bersiv ne bi faktorekî tenê ve girêdayî ye, lê belê bi komek faktorên tevlihev girêdayî ye, di nav de bêkarî, xizanî, strêsa psîkolojîk, nebûna hişmendiyê û hilweşîna malbatê. Gelek ciwan ji bo kêfê an jî ji bo dûrketina ji rastiyê dest bi ceribandina madeyên hişber dikin, lê ew zû xwe dixin nav çerxekê windabûnê ku dûrketina ji wê dijwar e.

Di aliyê tenduristiyê de, madeyên hişbir dibin sedema zirara mêjî, nexweşiyên giran ên demarî, kêmbûna xwarinê û lawaziya parastinê. Di heman demê de ew dibin sedema fikar, depresyon û tecrîda civakî. Di qonaxên dawî de ew dibe sedema tundûtûjî an xwekuştinê, ji ber ku bikarhênerên wê kontrola xwe winda dikin.

Ji bo parastina ji vê diyardeyê malbat roleke girîng dilîze, ji ber



ku nebûna çavdêrî û baldariyê dikare ciwanan bêhtir ji ceribandinan re bêparastin bike. Ji aliyekî din ve, danûstendina erênî di navbera dêûbavan û zarokan de û nîqaşkirina pirsgirêkên wan bi awayekî eşkere dikare gelek rewşên jirêderketinê asteng bike. Divê malbat bizanin ku xortanî û mezinatiya ciwan serdemeke hesas e ku bi taybetî ji bandora hevalan re xeternak e û divê ciwanan teşwîq bikin ku mezinbûna xwe ya kesane û şiyanên xwe yên takekesî zêde bikin û berxwedana xwe ya li hember zexta neyînî ya hevalan û kesên derdora xwe zêde bikin.

Ji bo pêşîgirtina li bikaranîna madeyên hişbir li cem zarok û ciwanan, pêwîst e malbat van tiştan bike:

-Zarokên xwe bi evîn û hezkirinê mezin bikin.

-Derfet bidin wan ku raman û hestên xwe îfade bikin.

-Jîngehek malbatî ya aram peyda bikin.

-Çavdêriya derdora hevalên wan ji nêz ve bikin.

-Hobiyên wekî werzîş, wêje û xebata dilxwazî pêş bixin.

**Madeyên Hişbir xewn û siberoja ciwanan winda dikin**

Diyardeya madeyên hişbir ne tenê pirsgirêkek bijîşkî ye, lê pirsgirêkek mirovî, civakî û exlaqî ye ku bandorê li her mal û her civakê dike. Ciwanên baş ên ku dikevin nav xefika tiryakê ne tenê tenduristiya xwe winda dikin, lê di heman demê de xewn û pêşeroja xwe jî winda dikin. Ji ber vê yekê, pêşîlêgirtin, hişyarkirin û hevkariya malbat û civakê çekên herî bihêz li dijî vê gefa gerdûnî ne. Heta ku îradeyek rastîn a jiyanê hebe, her ciwanek dikare ji madeyên hişbir re bêje na û rêya hêviyê li şûna rêya wêrankirinê hilbijêre.



# Kobanê bi berxwedana 134 rojan dîrok nivîsand

Her bajarek ji bajarên Kurdistanê dîrokeke wê ya lehengiyê heye, lê bajarê Kobanê yê Rojavayê Kurdistanê dîroka xwe ji nû ve bi destên Şervan, Egîd û Arînan nivîsand ku cîhan ji tirseke mezin a çeteyên hov DAIŞ’ê rizgar kir. Kobanê bi wêrekiya xwe bû cîhanî û 1’ê Mijdarê bû “Roja Kobanê ya Cîhanî.”

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Li Deraa ya li başûrê Sûriyê, gel di 15’ê Adara 2011’an de li dijî hikûmetê dest bi xwepêşandanan kirin. Ev xwepêşandan piştre belavî bajarên din ên welat jî bû, hikûmeta Eseed a têkçûyî ji bo çewisandina serhildanê li dijî gel dest bi tundiyê kir. Bi taybetî Ehrar El Şam, eniya El Nusra û gelek çeteyên din ên ku piştgiriya xwe bi taybetî ji dewleta Tirk û hin dewletên din ên herêmê digirin, li ser bajarên Rojava dest bi êrişan kirin. Êrişa destpêkê li dijî bajarê Serêkaniyê yê Rojavayê Kurdistanê hate kirin. Bi berxwedana mezin a ciwanên Kurd, hemû êrişên çeteyan hatin têkbirin. Gelê Rojava li aliyekî li dijî êrişên çeteyên ku piştgiriya xwe ji dewleta Tirk digirin têkoşîneke bê hempa meşand û li aliyê din jî xebatên xwe yên ji bo Rêveberiya Xweser didomand.

**Çirûzka Şoreşê ‘Kobanê’**

Li Kobanê di 23’yê Sibata 2012’an de meclisa gel dest bi xebatên xwe kir. Têkildarî vê yekê, xebatên mala jin, saziya zimanê Kurdî jî bilez hatin meşandin. Di 19’ê Tîrmeha 2012’an de, li Kobanê ya ku navê xwe weke sembola berxwedanê derbasî dîrokî kir, çirûska destpêkê ya şoreşê hate vêxistin. Xelkê Kobanê dest danî ser saziyên girêdayî hikûmeta berê û Şoreşa 19’ê Tîrmehê ragihandin. Çirûska ku li Kobanê vêketî, li herêma Efrîn û Cizîrê dewam kir.

**Hisabê DAIŞ’ê têk çû**

Çeteyên DAIŞ’ê di Hizêrana 2014’an de bajarê herî mezin ê Mûsilê tenê di 6 rojan de desteser kir. Di meha Sibatê ya heman salê de çeteyên DAIŞ’ê yên ku êrişî Şengalê kirin, êdî tirs belavî hemû cîhanê kiribûn. DAIŞ’ê li Sûriyê bajarê Reqa ji xwe re weke paytext diyar kir. Bi sedan jinên Şengalî yên ji Şengalê revandibûn, li meydanan difirotin. Di 15’ê Îlona 2014’an de çeteyên DAÎŞ’ê êriş birin ser gundê Serzûrî yê ku 37 kîlometre ji Kobanê dûr e. Hesab dikirin ku gundê Serzûrî ya ku ji bo herêmê di rewşeke stratejîk de ye, bigirin û Kobanê bikin du parçe, bi vî rengî wê dagirkeriyê hîn hêsantir bikin. Lê belê tiştek hebû ku çeteyên DAIŞ’ê hesab nekiribû. Kobanê ne mîna Mûsil, ne Reqa û ne jî Şengalê bû. Li wir 12 şervanên fedayî yên xwedî ruhê azad disekinîn. Berxwedana ku 12 ciwanên Kurd ên fedayî li Serzûriyê raber kirî, nexşerêya berxwedana ku ji vir û şûnde bê dayîn jî diyar kirin.

**Berxwedana Kobanê sînorên Kurdistanê derbas kir**

Xelkê Kobanê û şervanên wê bi derfetên xwe yên kêm li dijî çeteyên DAIŞ’ê berxwedaneke dîrokî ya 134 rojan, raber kir. Ev berxwedana ku roj bi roj dewam kirî, pêl bi pêl belavî hemû parçeyên Kurdistanê bû. Bi taybetî ji Bakurê Kurdistanê bi hezaran ciwan herikîn Kobanê. Gel sînor derbas kir û hewl da derbasî Kobanê bibe. Dewleta Tirk ku piştevanê herî mezin ê çeteyên DAIŞ’ê ye, li ser sînor ji bo astengkirina gel êriş dikir. Lê belê nekarîn yek gavê jî bi ciwan, jin, kal û zarokên Kurd bidin avêtin. Her roj hejmara kesên piştgiriyê didin berxwedana Kobanê, zêde dibû. Hingî ku li Kobanê berxwedan bilind dibû, berxwedana Kobanê êdî sînorên Kurdistanê jî derbas dikir û pêl bi pêl belavî hemû cîhanê dibû. Li her devera cîhanê Kurd û dostên wan, li ser piyan bûn.

**Têkçûn DAIŞ’ê li kobanê destpê kir û li baxozê bi encam bû**

Dema ku li seranserê cîhanê hêrsa li hemberî DAIŞ’ê ya berxwedana Kobanê afirandî mezin dibû, di heman demê de kîn û hêrsa dewleta Tirk a piştevaniya DAIŞ’ê dikir ya li hemberî gelê Kurd û şoreşa Rojava jî mezin dibû. Rewş giha asteke wisa ku Serokkomarê Tirk Recep Tayyîp Erdogan êdî piştevaniya xwe ya ji bo DAIŞ’ê bi awayekî eşkere îfade kir. Erdogan di 7’ê Cotmeha 2014’an de li Dîlokê got ku ‘dike ku Kobanê bikeve.’ Piştî vê axaftina Erdogan hêrsa gelê Kurd weke volkanekî teqiya. Di van serhildanan de ku weke ‘Çalakiyên 6-8’ê Cotmehê’ derbasî dîrokê bûn, di encama êrişên kontrayên Tirk de 50 welatiyên sivîl jiyana xwe ji dest dan. Li Kobanê di 26’ê Kanûna Paşîn 2015’an de yekem têkçûna ku dawiyê li DAÎŞ’ê bîne, hate ragihandin. Piştî Kobanê şervanên YPG, YPJ û QSD’ê ji bo hebûna DAIŞ’ê ya li ser xakên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dawî bikin, dest bi pêngavên xwe kirin. Berxwedana ku li Kobanê desrtpêkirî, li Minbic, Tebqa, Reqa û Dêrazorê berdewam kir. Li Baxozê jî bi encam bû ku Baxoz weke keleha dawî ya DAIŞ’ê dihat pênasekirin.




**Cîhan bi metirsiya DAIŞ’ê hişyar bû**

Gelên cîhanê asta xetereya ku çeteyên DAIŞ’ê bajarê Kobanê kontrol bikin, fêm kirin. Di vê çaçoveyê de li 93 welatên cîhanê mîna Arjantîn, Japan, Afganistan, Misir, Fas û Tirkiyê û piraniya welatên Ewropayê, bi mîlyonan kes daketin qadan û bang li hikumetên welatên xwe kirin tavilê bikevin tevgerê. Hemwextê xwepêşandanên li welatên cîhanê, bi dehan şervanan taxên Kobanê diparastin ku hindik mabûn bikeve destê çeteyan.

**Roja Cîhanî ya Kobanê**

1’ê Mijdarê wekî rojeke cîhanî ji bo piştgiriya bi berxwedana Kobanê re hate ragihandin. Bi vê boneyê li gelek welatên mezin ên cîhanê, xwepêşandan li rêyên sereke, balafirgeh û pêşiya balyozxaneyên Tirkiyê hatin lidarxistin. Xwepêşandêrên ku piştgirî dan berxwedana Kobanê, piştgiriya dewleta Tirk a bi çeteyên DAIŞ’ê re şermezar kirin.

Herwiha seferberiya giştî ya ku Rêber Apo li girîgeha Îmraliyê ji bo Kobanê bang kiribû, dîsa jî banga KCK’ê ya parastina Kobanê di şerê ‘çarenûsî’ yê ji bo qedera Kurdan de, xaleke girîng bû.

Li ser banga seferberiyê, ji welatên cuda yên cîhanê, Bakur, Rojhilat û Başûrê Kurdistanê bi dehan ciwan hatin Kobanê. Di heman demê de gelê Bakurê Kurdistanê li ser sînorê Kobanê mertalên zindî çêkirin û roleke girîng di rakirina dorpêça li ser şervanan de lîstin.

**Cîhanî herikîn Rojava**

Berxwedana şervanên YPG û YPJ’ê ji bo gelên cîhanê bû çavkaniya têkoşîn û berxwedanê. Di berxwedana şarvanan a li Konbanê de li gelek deverên cîhanê kesên ku qet heya niha dengê kurd û Kurdistanê nebihîstine ji bo di vê têkoşîna mafdar û xwedî îrade de cih bigirin, herikîn Rojava.

**Dewleta Tirk a faîst têkçûna DAIŞ’ê qebûl nake**

Dewleta Tirk a faîst a têkçûna DAIŞ’ê qebûl nake, ji bo ‘tolhildanê’ zend û bendan ba dide. Di destpêkê de li hemberî kesên ku piştevaniya berxwedanê kirine, di bin navê Doza Kobanê ya Kûmpasê de dest bi binçavkirinan kir. Bi sedan kes hatin binçavkirin, girtin û bi êşkenceyê re rû bi rû man. Van yekan jî têrê nekir li hemberî Kobanê planên nû yên qirkirinê xistin dewrê. Bi hincetên cuda her roj Kobanê bombebaran kir, zarok û jin qetil kirin.

**Kobanê keleha dîrokê û dîrok nayê windakirin**

Dewleta Tirk di 5’ê Cotmeha 2023’an de li dijî qadên Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişeke dijwar pêk anîbû. Di van êrişan de hemû binesazî, qadên xizmetê û qadên sivîlan hatin hedefgirtin û bi dehan sivîlan jiyana xwe ji dest dabûn. Gelê Rojava yê ku kesên di encama dagirkeriya Tirk de şehîd bûn, spartin axê berxwedana li hemberî van êrişan berdewam kirin. Herwiha di nava sala borî de bi seknên xwe yên bibiryar û berxwedêr nîşan dan ku wê li hemberî dewleta Tirk a dagirker û DAIŞ’ê serê xwe netewînin û têkoşîna xwe mezintir bikin. Dewleta Tirk careke din li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi êrişan kiribû. Di van êrişan de ku 4 rojan berdewam kir, dîsa qadên sivîlan, hemû binesaziya herêmê, qadên jiyanî û qadên gel ên aborî hatin hedefgirtin. Gelê Rojava dubare li hemberî êrişên dewleta Tirk li ber xwe dide.

Gelê Kobanê ê ku li hemberî êrişên DAIŞ û dagirkeriya dewleta Tirk berxwedana xwe berdewam dike û hemû gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di 1’ê Mijdarê de “Roja Kobanê ya Cîhanî” ku berxwedêran xwe bi cîhanê dayî îspatkirin, pîroz dikin.

# Xwesteka gelên Sûriyê ew e ku lihevkirinek çêbibe

Serokê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê anî ziman ku xwesteka hemû gelên Sûriyê ew e ku lihevkirinek di navbera hikumeta veguhêz û Rêveberiya Xweser de çêbibe û got: "Dewletên Rojhilata Navîn ber bi sîstema federalî ve diçin, herwiha wê Kurd di guhertina sîstema herêmê de xwedî rol bin."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Danûstandinên di navbera Rêbeberiya Xweser û hikumeta veguhêz a Sûriyê, siyaseta dewleta Tirk, gavavêtinên Israîl, Amerîka, Îran û Rûsyayê di herêma Rojhilata Navîn de her û her rojeva sereke ye. Derbarê heman mijaran de serokê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Hikumeta veguhêz ji aliyekî ve diyalogê û hevdîtinan bi Rêveberiya Xweser re dike û ji aliyê din ve êrîşan li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tîne, herwiha dorpêçê li ser Şêxmeqsûd û Eşerfiyê ddiomîne, hem jî xîtaba kîndariyê dide meşandin gelo sedema vê yekê çi ye?**

Weke tê xuyakirin bi vî rengî hikumeta veguhêz naxwaze lihevkirineke di navbera wê û Rêveberiya Xweser de çêbibe. Hikumeta Veguhêz peymana 10'ê Adarê di bin zexta Amerîkayê îmze kir. Yê ku vê hikumetê ji aliyê leşkerî û siyasî ve bi rê ve dibe dewleta Tirk e, dema ku hevdîtin û peymanek di navbera her du aliyan de çêdibe, yekrast roja din Şam berê xwe dide Enqerayê û hertişî jê re radigihînin, Enqere jî biryarê dide. Dewleta Tirk naxwaze lihevkirineke biencam di navbera Rêveberiya Xweser û Şamê de çêbibe. Ji ber vê yekê jî em dibînin ku êriş li Dêrhafir, Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi destê çeteyên dagirkeriya Tirk pêk tên. Ew komên çete dibêjin em tevlî berevaniya Sûriyê bûne, lê ev yek bi nav çêbûye. Dewleta Tirk çeteyên xwe yên bi navê Artêşa Niştîmanî Dêrazorê bi cih kirine, ew dibin destek ji DAIŞ'ê re û heya roja îro êrişî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin. Dewleta Tirk her der xistiye bin serweriya xwe, ew li sê cihên sereke di Şamê de ne, lê ji bilî vê xalê hin kesayet hene ew zilamên Tirkan in, mînaka wan Hesen Eldixêm, ew ne xwedî sîfeteke fermî ye di hikumetê de, lê di her cihî de hazir e. Dewleta Tirk Hesen Eldixêm dehef dide bi ser her tiştî de, di destûr, hilbijartin û hwd… de dide pêş. Colanî zilamekî paragmatî ye, dikare di rojekê de gelek caran xwe biguherîne, lê ji ber zexta dewleta Tirk nikare biryarekê ji bo gelên Sûriyê bide. Ew ji bo mayindekirina li ser hukim û berjewendiyên xwe tev digere. Colanî ji ber zext û serwereiya Tirkiyê li milekî, hem jî zexeta Amerîka, Ewropa û dewletên Erebî nikarîbû biryarekê bide, hîna nizane ku wê li ser kîjan riyê bimeşe.

**Eger lihevkirinek di navebera Rêveberiya Xweser û hikumeta veguhêz de çêbibe û li gorî daxwazên gelên Sûriyê be wê çi encaman bi xwe re bîne û eger lihevkirin çênebe wê rewşa Sûriyê ber bi kû ve biçe?**

Xwesteka gelên Sûriyê ew e ku peyman û lihevkirin di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta veguhêz a Sûriyê de çêbibe. Hebûna hikumeta veguhêz girêdayî lihevkirina wê bi Rêveberiya Xweser re ye, Amerîka jî gelek zextê lê dike



da ku ew bi rêveberiyê re lihevkirin çêbibe. Di destpêkê de Tom Barak di destpêkê de xwest zextê bike li Rêveberiya Xweser û QSD'ê bêçk bike, wî axaftinên tewşo mewşo kirin, lê paşê ji wan vegeriya. Barak ji bo pêkanîna berjewendiyên şexsî û meşandina siyaseteke li gorî dilê Tirkiyê tevgeriya û xwest QSD'ê çekan deyne. Lê Rêveberiya Xweser û hêzên siyasî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li gorî hêviyên hemû pêkhateyên xwe derket û tişta ku Barak, hikumeta veguhêz û Tirkiyê dixwest çênebû. Di roja heyî de zêdyî 50 ji sedî ji gelên Sûriyê piştgirtiya QSD'ê dikin, li Berava Sûriyê û Başûrê Sûriyê jî hebûna QSD'ê û Rêveberiya Xweser daxwaz dikin. Di vê dema dawî de agahî hene û danûstandin çêdibin, dibe ku lihevkirinek çêbibe li seranserî Sûriyê, lê wê ji sedî sed ne li gorî daxwaza gelên Sûriyê be, lê belê kêm zêde wê erêkirineke giştî be. Li me giran tê dema ku em dibêjin ku bi sedema mijarên mezhebî, oldarî û nasnameyê şer derdikeve. Gelên Sûriyê piştî kirîzeke mezin, ew ji xwînrijîn û şeran têr bûne, hem jî naxwazin ku şer bê domandin. Aliyên weke dewleta Tirk û çeteyên wê, dixwazin şer derkeve, eger şer derket wê ne tenê di navbera hikumeta veguhêz û herêma Rêveberiya Xweser de çêbibe, lê belê li seranserî Sûriyê wê şer derkeve. Wê giraniya şer li Beravê û Başûrê Sûriyê bike, ji ber ku li wir jî hîna rewş ne aram e.

**Di dema heyî de li herêmê baskên Îran hin bi hin tên birîn, Tirkiyê dixwaze xewnên xwe pêk bîne, serweriya Israîl û Amerîkayê zêdetir dibe, Rûsya hewl dide hebûna xwe li Sûriyê bidomîne, li gorî rûdan û geşedanên ku li seranserî Sûriyê û herêmê çêdibin, gelo rewşa Sûriyê û herêmê ber bi ku ve diçe?**

Her kes destnîşan dike ku gavên pratîk ên guhertina Rojhilata Navîn ji bo nexşerêya wê ya nû di 7'ê Cotmeha sala 2023'an de hat avêtin ku dema Hemasê êrişî Israîlê kir, lê ev yek çewt e, guhertina rewşa Rojhilata Navîn ji serkeftina Kobanê dest pê kir. Serkeftina Kobanê hişt ku reg û rewşa herêmê bi tevahî were guhertin, gelê Kurd li Rojava nehişt ku çeteyên DAIŞ'ê serweriya xwe li herêmê tevahî bike. Di herêmê de du proje hebûn, yek jê Israîl û hevalbendên wê, ya din jî Îran û hevalbendên wê, di nav wan projeyan de projeyên aborî, siyasî û leşkerî hene. Piştî şikestina Îran di Sûrî, Lubnan, Yemen û heya astekê di Îraqê de, Îran xwe da paş û dewleta Tirk xwe da pêş. Ji destpêka kirîza Sûriyê ve, dewleta Tirk dixwaze nexşerêya Mîsaqa MILLÎ pêk bîne, berî rêjîma Baas bikeve Erdogan xwe diavêt Beşar El-esed da ku projeya Rêveberiya Xweser û destkeftiyên Kurdan têk bibe, lê bi saya berxwedaniya şervan û siyasetmedarên Kurdan xewna dewleta Tirk têkçû. Bi hatina Colanî re Tirkiyê dixwaze serweriya xwe li ser Sûriyê ferz bike û pişta xwe bi Colanî girêde. Dewleta Tirk piştî wê neçar bû ku xwe bavêje riya aştiyê, Tirkiyê ne aştîxwaz e, lê belê Kurd bi aştiyê tên naskirin, doza Kurdan temenê wê 100 sal e, di serdema bûrî de gelê Kurd bê maf man li çar dewletên serke, Kurd ne amade bûn ji siberoja xwe re, lê di îroj Kurd xwedî roleke sereke dilîzin di Rojhilata Navîn de û wê li her çar dewetan bigihêjin mafê xwe. Siyaseta dewleta Tirk hişt ku siyaseta wê û ya Israîlê bibe terzî hev. Dema ku Tirkî ber bi parçebûnê ve çû, xwe avêt Îmraliyê û Rêber Apo. Li aliyekî din Rûsiya ji ber şerê wê û Ukranya jî nikare weke berê projeyên mezin li herêmê pêk bîne, niha şertûmerc û ferzkirina ji bo aştiyê li ser tê meşandin. Lê hebûna Rûsya li Sûriyê wê bidome, çûyîna Colanî û Şeybanî bi erêkirina Amerîka çêbû, da ku peymana 49 salan a ku di navbera Rûsya û rêjîma Baas a têkçûyî pêk bîne. Herwiha wê Rûsya hebûna xwe di Sûriyê de bidomîne, ji vê yekê em dibînin ku gavên ku tên avêtin di çarçoveya gavavêtina ber bi fediraliyetê de ne. Rojhilata Navîn û her çar dewletên sereke yên ku gelê Kurd lê dijî ber bi sîstema federalî ve diçe. Di vê herêmê de jî wê Kurd xwedî roleke sereke bin di mijara siyaseta fedralîbûnê.

# Kurd di eynika dîrokê de!

**Volqan Elî**

Dîrok; yanî raboriya mirov, xweza, cîhan û gerdûnê... Lê ne tenê tiştê borî, derbas bûyî û di heman demê de 'niha' jî di nava xwe de dihewîne. Wekî çemek ku ji çavkaniya xwe derdikeve û ber bi deryayê ve dimeşe... Hin serkanî hene; ava wan pir vala diherike. Ta ku xwe bigihînin hedefa xwe, deryayê, bi dehan bi sedan av û çeman tevlî xwe dikin, mezintir dibin û dawiya dawî bi bextê xwe re dibin yek. Ti car ne wekî destpêka xwe ne, lê bêyî çavkaniya xwe jî ew ne ti tişt in. Mixabin hin serkanî hene; dibe ku ava wan jî vala biherike, bibin çem û rûbarên mezin. Di ser riya xwe de têra xwe bi avên boş û serkaniyan xwe bi xwedî nakin; Lewra dawiya dawî di deştekê de yan jî di sahrayekê de dimirçiqin: Bê bextewarî ne.

Yanî çarenûsa dawî hema bêje ji destpêkê ve hatiye xêzkirin. Rêber Apo vê wekî; "Em di destpêka dîrokê de veşartî ne; dîrok jî di roja me ya îro de veşartî ye" tehlîl dike. Dîrok niha ye". yanî ew çem û rûbara ku xwe gihandiye deryaya xwe ta ji destpêka xwe ve xwediyê wê hêz û derfetan bûye: ya ku bê bextewarî, di sahrayekê de fetisiye jî dîsa wisa... Çemê Kurdan jî di destpêka xwe de wisa xurt herikiye û hatiye roje me ya îro.

Li gorî destkeftên civaknas û zanyarên arkeolojiyê (Gordon Childe, Bradway, S. Kramer, K. Schimid û hwd), mirovahî texrîben yek milyon sal berê ji parzemîna Afrîkayê rabûye, di Rîfta Behra Spî re xwe gihandiye seriyê rojava yê Hîlala Zêrîn. Ji wir belavê quntarên Toros-Zagrosan bûye. Di demeke bi qasî sed hezaran sal de li Mezopatamyaye, ta Kendava Basrayê di nava Hîlala Zêrîn de xwe kemilandiye û ji vê derê dubare belavî çar aliyên cîhanê bûye.

Ev çend hevokên li jorî hema ne hizirên çend zanyarên bi xîret û rûmet in. Rast e ku xîret û rûmeta wan heye, hem jî pir mezin e! Lê wan di heman demê de xwe berdana vê herêmê ku me navê wê aniye li ser ziman, şikeft bi şikeft, dol û newal, hemû lêkolîn kirine yan jî tehlîl û analîzên cur bi cur bi pêşxistine. Mînak, di şikeftên Libnan, Efrîna dagirkirî yên wekî Şikefta Dûderî de qerqûdeyên yek milyon salî peyda kirine. Dîsa di şikefta Şanîdarê de qerqûdeyên mirovan ên şêst hezar salî peyda kirine! Lêkolînên wan bi vê jî nemane, li derdora Kerkukê herêma Zerziyan berhemên çandî ku wê demê mirov bi kar anîne, wekî bermahî peyda kirine. Li aliyê din li Mezopotamyaya jorî, nêzîkî Semsur-Riha perestgehên Xirabreşkê vedîtine ku ev xwe dispêrin ji beriya mîladê yanzde hezar sal.

Li gorî kişfa van zanyaran dibe ku yek ji destkefta herî mezin jî ew be ku mirov şoreşa ziman (Homo Sapîens) cara yekemîn li vê herêmê pêk anî ye. Yanî mirov li vê herêmê dest pê kiriye bifikire, bibe mirov: Zimanê ku em niha pê diaxifin, di dîrokê de li vê herêma Hîlala Zêrîn hatiye peyda kirin. Piştî vê qonaxê jî, ji vê derê belavî cîhanê bûye.

Qonaxa herî dawî, ji beriya mîladê 3-4 hezar sal berê, pêvajoya eşîrbûn yan jî etnîsîtebûnê dest pê kiriye. Pir qebîliyên Aryenîk ku li Mezopotamyayê jiyîne, li derdora rêzeçiyayên Toros-Zagros jiyîne di roja me ya îro de em wekî pêşiyên Kurdan qebûl dikin (Hurrî, Hîtîtî, Mîtanî, Gûtî û hwd) . ne tenê proto-Kurd yan jî qebîleyên Aryenîk, yên Semîtîk jî li van hawîrdoran xwe girtine yan jî bi qebîleyên herêma Hîlala Zêrîn re têkildar bûne.

Ev hemû divê îşareta tiştekî bikin! Yanî encameke vê heqîqetê heye: Encamek ku kok û rayê xwe di nava dehezar-sedhezar salî de veşartî!.. Rastiyek ku bûye çand, bûye ziman, bûye zanist, bûye huner, bûye jiyan heye! Ruxmî vê tu dê wekî hêz yan jî, çar hêzên dagirker yan jî wekî cîhana dagirkeriyê çawa rabî vê tine bihesibînî, tine bikî û ji xwe re bêjî, "temam, min kokê Kurdan qeland. Kurdistana xiyalî di vê derê de binaxkirî ye!".

Dema şerê cîhanê yê yekemîn de 1,5 milyon Ermen hate qetlkirin. Îro piraniya welatên cîhanê, vê jenosîda hatiye li ser vî gelê mezlûm bi fermî nas dike û dizane jî. Lê di heman pêvajoyê de bi piranî bi destê Osmaniyan û ji bo berjewendiyên wan 700 sed hezar Kurd hatine qetlkirin ti kes behsa wê jî nake!

Hem di pêvajoya Serhildana Şêx Seîd de, ta bi Komara Kurdistanê ya Mihabadê û hem jî beriya wê li Başur û li cihên cuda yên Kurdistanê bi sed hezaran Kurdên bê parastin hatine qetlkirin!

Dîsa jî, dema ku em di vê sedsala 21'emîn de lê dinêrin, ruxmî ku herêm û cîhan tev di nava agirekî dojehî de dişewite, Kurd wekî çinareke pir mezin ku li qiraxa çemekê rayên xwe şandiye erdê, xwe bi erdê ve xurt girtiye û her roj aliyekî xwe şîn dikin!

Ev, gelek pêvajoyeke bi êş e û pir sedemên wê hene: Lê sedema herî sereke ya xweragiraya Kurdan dîroka wan qedîm e. Îro di serî de Rojava, ceribandina Bakur û Rojhilatê Sûrî li ser mîrateyeke wisa dûr û dirêj, dest pê kiriye jiyaneke nû ava bike.



# 'Nepêkanîna mafê hêviyê ji bo Rêber Apo binpêkirina pîvanên mafê mirovan e'

Hiqûqnas Mihemed Emîn Neîmî destnîşan kir ku nepêkanîna mafê hêviyê ji bo Rêber Apo binpêkirina pîvanên mafê mirovan e û got; "Ji bo serxistina pêngava Aştî û Civaka Demokratîk pêwîst e demildest Rêber Apo fîzîkî serbest bê berdan."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Weke tê zanîn ji mafê her mirovekî girtî ku piştî 25'an serbest bê berdan, lê li Tirkiyê zagon û pîvanên mafên miovan tê binpêkirin bi taybet di doza Rêber Apo de ku Tirkiyê bi rengekî sîstematîk Mafê Hêviyê paşguh dike û her gavên pêkanîna wê dereng dixe. Tevî bangên domdar li ser asta cîhanî ji bo çareserkirina doza mafê hêviyê lê rayederên Tirkiyê tolaq dikin, ev yek astengiyek li pêşiya hewldanên bidawîbûna pevçûnê bi rêya diyalog û demokrasiyê ye nemaze bang û hewildanên Rêber Apo yên ji bo aştiyê û civaka demokratîk. Derbarê pêkanîna mafê hêviyê hiqûqnas û Hevserokê Însyatîfa Parêzên Sûrî ya Parastina Rêber Abdullah Ocalan Mihemed Emîn Neîmî ji Rojnameya me re axivî.



Hiqûqnas Mihemed Neîmîdi destpêka axaftina xwe de tekez kir ku mafê hêviyê mafekî zagonî ji bo her girtiyekî ye û wiha anî ziman: "Revandin û girtina Rêber Apo li dijî mafên miorvan bû, ji ber ku tu sûc nekiriye, biryarên ku di der heqê wî de derdikevin, binpêkirina mafê hêviyê û derengiya bicihanîna wê biryareke polotîk û siyasî ye, ne biryareke dadwerî û zagonî ye ku li gorî pîvanên mafan. Biryara girtina heta hetayê ku der heqê Rêber Apo de derket dewleta Tirk bi îşkenceyê jî girêda. Li gorî pîvanên dewleta Tirk girtina het hetayê li ser 30 salî ye, ev binpêkirineke ji pîvanên mafê mirovan e ji ber ku ev yek di hevpeymana Viyenayê de hatiye tekezkirin ku hemû zagon li ser asta navdewletî divê bêne pêkanîn. Zagona ku li Tirkiyê tê pêkanîn di derbarê Rêber Apo de li dijî pîvanê zagonên mafê mirovan e, divê zêdetirî 25 salan di girtîgehê de nemîne herwiha divê lêborîneke çêbibe û mafê hêviyê bê pêkanîn. Rêber Apo di girtîgehê de 27 sal derbas kiriye û ketiye temenê 78'an de, zagonên mafên mirovan dibêje ku li ser 70'ê salî nema çêdibe girtî di girtîgehê de bimîne û çênabe biryara der heqê wî de bêne berdewam kirin. Dewleta Tirk di derbarê Rêbe Apo de ji sedî 100 zagonên navdewletî binpêkiriye."

**'Di danazana mafên mirovan de mafê jiyanê mafê herî pîroz e'**

Hiqûqnas Mihemed Neîmî wiha domand: "Mafê hêviyê pîroziyeke bêhempa dide jiyana mirovan. Mafê hêviyê li gorî xala sêyemîn ji Hevpeymana Mafê Sivîlî, Polotîkî, Çandî, Aborî û Civakî sala 1966'an derketiye ku dibe mûvikeke ji mûvikên herî sereke di nav zagonên navdewletî de di çarçoveya mafê hêviyê de. Ev zagon hem dijî darvekirinê ye hem li dijî girtina mirovan zêdetirî 20 salan e û tekez dike ku girtiyê temenê ser 70 salî çênabe di girtîgehê de bimîne her çend bi dozên giran jî hatibin hukim kirin.

Di heman demê de jî xala mafê jiyanê di Danazana Giştî ya Mafên Mirovan ya 1948'an jî heman yekê dibêje ku mafê jiyanê mafekî bingehîn e û çênabe kesek di girtîgehê de bimîne. Eger em vegerin binpêkirinên dewleta Tirk ku li dijî Rêber Apo pêk aniye mirov dikare dozeke dijî wê veke. Dewleta Tirk weke dijberekî ji Rêbe Apo, ji fikir û gelê wî re ye."

**'Dewleta Tirk bi rengekî şiklî tev digere'**

Hiqûqnas Mihemed Neîmî bal kişan ser banga aştiyê û wiha got: "Her kes dizane bê sîstema girava Îmraliyê çi ye, sîstema îşkence û tecrîdê bi awayekî giran li ser Rêber Apo hat ferzkirin heta gihaşt astekê ku êdî tu agahî li ser rewşa wî nedihat nas kirin. Heta ku rewş li Erogan teng bû ku xwe avêt Rêber Apo lewre hişt ku Omer Mihemed Ocalan di 23'ê mijdara 2024'an de hevdîtinê bike, êdî di 27'ê Sibata 2025'an de Rêber Apo banga Aştî û Civaka Demokratîk raghand, lê heta îro dewleta Tirk tu gavên ku baweriya mirov pê bê ne avêtiye, tenê di rengekî şiklî tev digere.

Ji bo şopdariyê ji pêngava Aştî û Civaka Demokratîk bê kirin divê Rêber Apo serbest bê berdan û bi renegkî fîzîkî rêveberiya vê projeyê bike. Tirkiyê pîvan, daxwaz û berjewendiyên wê yên veşartî hene ku naxwaze Rêber Apo bi fîzîkî azad be."

**'Dosya Rêber Apo girêdayî dosya mafan e'**

Hiqûqnas Mihemed Ehmed Neîmî wiha gotina xwe qedand: "Dosya Rêber Apo ne tenê girêdayî kesayeta wî ye lê dosya mafan pê girêda ye. Rêber Apo daxwaza wî mafê demokratîk e ku mafê kurdan di destûreke nû de bê misogerkrin li gorî pîvanê zagonên navdewletî. Em dîsa destnîşan dikin ku divê bi awayekî lez mafê hêviyê bê pêk anîn ji ber ku derengiya wê dê bandorê li ser gelan bike, ev yek jî Rêber Apo di hevdîtinên wî yên herî dawî de tekez dike. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê jî gelek caran bang li Tirkiyeyê kiriye ku bi awayekî yasayî mijara mafê hêviyê çareser bike, lê rayedarên Tirkiyeyê van bangan paşguh dikin. Weke parêzerên Rêber Apo di heman demê de em kar û xebatên xwe ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û serkeftina banga Aştî û Civaka Demokratîk bidest bixin li ser asta herêmî û cîhanî bi taybet di Rojava de; berdewam dikin."

## Tirkiyê dest ji hevalbendên xwe yên xwînmêj bernade...



**Zekî Bedran**

Wezîrê karên derve yê Tirkiyê Hakan Fîdan diyar kir ku "vekişîna demildest ya QSD'ê ji herêmên ku piranî Ereb lê dijîn, şerta herî sereke ye û divê gava yekem be. Ev hîn nehatiye bicîhanîn. Her kes li bendê ye ku ev pirsgirêk çareser bibe. Ger çareser nebe, dibe ku pevçûnên pir cidî derkevin holê." her wiha Fîdan teqez kir ku "QSD'ê ji bo paqijkirina endamên PKK'ê ji Tirkiye, Iraq an Îranê tu nexşerêyek pêşkêşî Tirkiyê nekiriye... PKK'ê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir kiriye û hêzek dagirker û kolonyal e." Ev daxuyanîyên wisa awayekî zelal wekî amadekariyên êrîş û komkujiyê li dijî gelê Kurd in. Li ser bingeha xerabkirina biratiya qaşo Kurd ûTirk in. Ew îdia dikin ku dixwazin pirsgirêka Kurd çareser bikin. Rêber Apo ji bo vê yekê gavên dîrokî avêt û şer û têkoşîna çekdarî bi dawî kir. Hebûn û têkoşîna çekdarî ya PKK'ê bi dawî bû. Lê ew berdewam dikin ku PKK'ê wekî hincetek ji bo berdewamiya dagirkirina Sûriyê, taybet jî zext û gefên li ser Kurdan zêde bikin. Bêyî PKK'ê, ti hincetek wan ji bo şer û pevçûnê li Sûriyê tine ye. Divê ew bi eşkere dijminatiya xwe ya li hember Kurdan ragihîn in. Ev ne hincetek e ku li tevahî cîhanê bê pejirandin. Ew berdewam dikin ku hemî kiryarên xwe yên xerab bi PKK'ê û qaşo têkoşîna li dijî terorê rewa bikin.Gotinên ku dibêjin divê QSD'ê tavilê ji herêmên ku piraniya wan Ereb in vekişe, nîşan dide ku li ser deskeftiyên Kurdan çi plansaziyên xêrab tê meşandin. Ew dixwazin nîjadperestiya Ereb gûr bikin û Ereb û Kurdan li dijî hev bidin şerkirin. Rejîma Baasê jî heman kiryar pêkdianî. Li Dêrazorê, hin komên çekdar hatin rêxistinkirin û hewl dan ku alozîyan derbixin. Hin ji wan wekê qaşo milîs li ser navê dewleta Îranê tevdigerin. Kesên ku di tometbarên sucên cûda ji herêmê reviyan û li cem rejîmê bi cîh bûn. Niha, dewleta Tirk van koman jî sazûman dike, û HTŞ'ê jî piştgiriyê dide wan. Wan ev komên çete û dagirker wekî eşîrên Ereb ên ku li dijî QSD'ê şer dikin nîşan dan, û ew vê yekê hîna jî didomîn in. Bi daxwaza ku QSD ji herêmên Ereban vekişe, dewleta Tirk hewl dide ku yekîtî û aramiya di navbera pêkhateyên Ereb û Kurdan de xerab bik e. Lê ji nîvê zêdetir şervanên QSD jixwe pêkhateyên Ereb pêktên. QSD'ê nûnertiya gelê tevahiya Sûriyê dik e. Çima ew ê dev ji gel û axa xwe berdin? Wekî din, QSD razî bûye ku tevlî artêşa Sûriyê bibe. Danûstandinên li ser vê mijarê berdewam dikin. Hêzên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 10'ê Adarê de li Şamê bi Rêveberiya Xweser re peymanek îmze kirin. Li gorî vê yekê, amadekarîyên pêkanîn û hevkariyê didomin. Hêzên mîna DYA jî hewldanên xwe ji bo pêşxistina pêvajoyê didomînin. Ji bo vê armancê li Parîsê civînek hatibû plankirin. Divîyabû DYA, Fransa û NY beşdar bibin û wekî garantor tevbigerin. Lê dewleta Tirkiyê ev yek asteng kir. Wan zext li ser HTŞ'ê avakir, wan jî xwe hevdîtinan vekişand. Wan nexwest ku raya giştî û hêzên navnetewî wekî çavdêr an navbeynkar tevlî bibin. Ew hewl didin ku pêşî li deskeftîyên Kurdan bigirin ku nebin mijara danûstandin û peymanên navnetewî.Gelê Kurd sedsala 20'an bê statû derbas kirin, û dixwazin di sedsala 21'an de jî wisa bimînin. Ev bûye stratejiyeke domdar ya dewleta Tirkiyê.Dewleta Tirkiyê gelek caran jî li ser HTŞ'ê jî zext ava dik e. Mîna ku HTŞ artêş û dewletek hevgirtî ava kiribe û Kurd astengiyê wê bikin. Armanca sereke ya HTŞ'ê ne aramiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Ew di navbera xwede lihevkirin e Bêyî destwerdana dewleta Tirkiyê, QSD, Rêveberiya Xweser û hikûmeta veguhêz ya Şamê dê pirsgirêkên xwe zûtir çareser bikin. Tirkiye israr dike ku roleke navendî bilîze ne ku bibe navbeynkar. Ew her wiha hêzên mîna DYA û Fransayê jî asteng dike. Wezîrê derve yê Tirkiyê bi PKKê ve mijûl e û bi berdewamî balê dikişîne ser kesên ku beşdarî şerê li dijî DAIŞ'ê dibin. Ma çi hevkariya Kurdan bi hewr e xwezayîtir e? Ew her tim dibêjin ku yên ku ne welatiyên Sûriyê ne divê ji Sûriyê derkevin. Ew baş dizanin ku Kurdên ji beşên din ên Kurdistanê li Sûriyê ne mayînde ne. Gelek ji wan jixwe vegeriyane. Yên ku mane baş in û kes nabêje ku ew ê neçin. Rêveberiya Xweser û QSD xwe bi xwe birêve dibin. Di vê yekê de ti pirsgirêk tine, lê Tirkiyê ye ku pirsgirêkan ava dike. Pirsgrêka rastîn li Sûriyê bi hezaran niştecihên Asyaya Navîn, Efxanî û Afrîkî ne. Piraniya wan ji bingeha xwe ji DAIŞ û El Qaîdeyê ne û hîn jî heman bîrdoziyê re xebat dikin. Tevahiya cîhanê ji wan bêzar e. Lê hikûmeta Tirkiyê vê rastiyê paşguh dike. Berevajî vê, ew dixwaze ku ew li Sûriyê bimînin û HTŞ'ê xurt bikin. Tirkiyê ti nerazîbûnek li hember beşdarbûna van çeteyên qirker ya di na desthiladariya Şamê de nîşan nade. Divê gelê Sûriyê û kesên ku piştgirîya demokrasî û aştiyê dikin bizanin ku Tirkiye şerekê dagirker û qirker dimeşîne. Ew bi xwe dibêjin ku ev şer dê pir dijwar be. Weke herêmên Durzî, ew şerekî bê pîvan û xwînrêj di bin qaşo bingeha eşîrên çekdar de plan dikin ku li dijî QSD'ê şer bikin. Divê were fêmkirin ku Tirkiye gurkirina alozî û gengeşiya herêmê de roleke diyarker dilîze.

## Qonaxeke Nû



**Farûk Sakik**

Dema ku muzekereyên Îrlanda Bakur bi Peymana "Îniya Pîroz" bi dawî bûn, di hevdîtinan de George Mitchell jî cîh digirt. Gotinek wî heye:

"Nayê gotin ku alî xewnên xwe biterikînin; divê ji wan ev yek neyê xwestin. Divê çareseriyek were pêşniyarkirin ku rê bide her du aliyan da ku xewnên xwe pêk bînin. Lê bi awayek aştiyane."

Îro ji dewlet ji Tevgera Kurdan vê yeke dixwaze. Tu Kurdek dest ji xeyalên xwe yên Kurdistanek azad bernade. Gerîla jî dema çek şewitandin, ew roj xeyalên xwe neşewitandin. Di xeyalê wan de azadiya Rêber Apo hebû. Dema azad bibuya wî yê rê li pêşiya xeyalên wan vekira.

Di 26'ê Cotmehê de, tevgera azadiyê ji bo pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bigihîne qonaxa duyemîn, hemû hêzên xwe yên gerîla vekişand Herêmên Parastinê yên Medyayê. Di heman deme de merasimek sembolîk jî hat lidarxistin. Dewlet jî xwedî berpirsyariyek, divê demildest gavên siyasî û hiqûqî bavêje. Di destpêkê de dive azadiya Rêber Apo ya fizikî gav werin avêtin. Ya duduyan jî ji bo gerilla vegere Bakur tevlî xebatên siyaseta demokratik bibe û kesên ji sedemên cûda bi salan e li sirgunên in vegerin, qanûn werin derxistin.

Di nav gel de guftugoyên cûda têne kirin. Gumanên wan henin. Dibêjin piştî merasima çekşewitandinê diviya dewlet gav bavêta. Lê bi tenê li meclisê avakirina komisyonek sînorkirî hişt. Ev komisyon esas mixatabê pêvajoyê Rêber Apo re hevdîtinan pêknayne, Gerîlla çima gava duyem avêt? Di nav civakê de ev deng bilindibin.

Serokê komusyona Meclisê, Nûman Kurtulmiş piştî vê merasîmê daxwiyaniyek dida û digot, êdî şer bi dawî bûye dive di dewsa çekan de fikir û raman derkevin pêş. Ev axaftina xwe jî bi gotina li Sûrî, Iraq û Îranê jî çekê şer bêdeng bibin, dawî dikir. Divê ji îro bi şûn de zimanê aştiyê were bikaranîn. Divê Kurtulmûş jî ji hişmendiya metîngeriyê derkeve. Ew heyeta ku Rêber Apo li bendeye bişîne Îmrali.

Gerîla di pêvajoyên aştiyê de berpirsyariyên xwe dizane. Ji bo pêşî li provaksiyon û êrişan bigire derbasî heremên "parastinê" dibe. Li vêderê bi tene heta ew roj were xwe diparêze.

Dema merasîmê daxwazek wan hebû: Weke dawîn banga me, di serî de ji bo jin û ciwanan ji bo hemû gelên me ye. Pêvajo ne ew pêvajo ye ku ji hinekan hin tiştan hêvî bikin, pêvajo ew pêvajo ye ku bi têkoşîna rêxistinkirî avakirin û qezenckirina jiyana azad û demokratîk e. Wê wextê her kesên ku xwe di nava vê jiyanê de dibînin, ji bo serketina 'Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk' di asta seferberiyê de divê têbikoşin.

Têkoşînek mezin li Bakûr divê were kirin. Têkoşîna zimanê Kurdî. Rêber Apo jî di hevdîtinek xwe de digot ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdehiyê xebatê bimeşînin. Ji dibistana serete hetanî zanîngehan pêwîst e zimanê Kurdî perwerde were kirin.

Berê dihat gotin êrişên dewletê hene. Di roja me de ev êriş tunenin. Gerîla jî ji bo ew êrîş rawestin gavan davêje.

Şaredarî dikarin ji bo navê Kurdî li kolanan, li qadan, li gundan bikin xebatê bimeşînin. Dibistan werin vekirin. Ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê jiyanê gereke bênavber xebat werin meşandin.

Siyaseta demokratîk ji pozisyona parastinê derkeve. AKP bi zanebûn dixwaze hertim DEM Partiyê bi hin tiştên cûda tawanbar dike da ku ew jî bi tene xwe biparêzin. Heman tiştî anî sere CHP'ê. CHP îroj bi tene di moda parastinê de ye. Erka xwe ya mixalefetê bi kar nayne. DEM Parti di vî warî de baldar be.